

DEMA MIROV LI SER PIRSGIRÊKÊN ZIMANÊ K'URDÎ BI SÎSTÊMÎ R'ADIWESTE, HEMÛ BINGEH Û SERSEDEMÊN WAN DERTÊN BER Ç'AVAN...

V

HINEK TÊBÎNÎ BI BONEYA “DAXWÎYANÎYA”¹ MAMOSTA DEHAM EBDULFETAH ...

Ezîz ê Cewo

Beşê berî vê li vira ye:

https://amidakurd.net/ku/tekst/LI_SER_PIRSGIRÊKÊN_ZIMANÊ_K_URDÎ

Em nirxandinên xwe didomînin, xwendevanên hêja!

Ji ber ku, piştî gotara dawîyê ya vê r'êzê navbereke dirêj pêk hat, ezê li vira careke dinê bînim bîra we, k'a me ji çî destpê kirye, û em li ser çî pirsgirêkan r'awestyane. Di sêrî da divê bê gotin, ku mabest û lêymotîv (îdêaya sereke) a van r'êzegotaran ew bûye, ku bi r'êya dahûrandin (analîzkirin) û nirxandinên cihêr'eng pirs û pirsgirêkên r'êzimanî bîn r'onîkîkirin, û bê zanîn, k'a mirov çawa dikare bingeh, qanûn û r'êgezên r'astnivîsînê û r'astaxavtinê bişopîne, û ewan t'evlihevî, nak'okî û çewtîyan bert'eref bike, yên ku bi r'ojane di nava axavtina zarkî û nivîskî da r'ûdidin û li ser her gavekê di axavtin û danûstandinan da, di medya civakî, çapemenî û r'adîo-tûlêvîzîyonên me da r'astî me tên. Di gotara vê r'êzê ya “Têbînîyên giştî” da min sersedemên pirsgirêkên vî r'engî makkiribûn². Xwendevan bi xwe dikarin gotarê careke dinê li ber ç'avan r'a derbaz bikin, ji bo ku agahî û zanînen xwe yên di derbarê mijarê da t'eze bikin û bê nak'okî pirsgirêkên r'astnivîsîn û r'astaxavtinê ji hev vebijêrin, makkikin û derxin zanebûnê.

Piştî makkirina pirsgirêkên giştî yên vî warî em hatin ser pirsên nivîsa k'urdî û paşê derbazî pirsgirêkên r'astnivîsîn, r'astaxavtin û r'astxwendina paşdaçekên “r'a”, “va” û “da”³ bûn...

Û li vira jî, hema di nava vê xelayî-birçîbûna helwest û nêr'înên vî warî da nêr'îna mamostayê hêja Deham Ebdulfetah heya astekê dilê min baristan kir. Û wê demê min bi xwe ji xwe r'a got: “*Mala Xwedê ava, mirovek derk'et, ê ku ne t'enê pirsgirêkan dibîne, lê wisa jî bi dilêştî dîtî û pêşniyarên xwe pêşk'êş dike!*”

Divê hema di sêrî da bibêjim, ku, wek r'êgez, hemû gotinên kekê Deham ezê li vira bê guhar'tin, wek ku ew di binenimûneyê (orîgînal) da hatibûne nivîsîn, bînim.

Weha, piştî ku nêr'în û têbînîyên xwe yên r'exneyî di derbarê “Rêbera Rastnivîsînê” da bi encam dike, mamosta Deham weha pêva diçe: “... *Ev nirxandina me qet nahê wê wateyê ku Rêbera Rastnivîsînê çî mijareke hêja û balkêş li rastnivîsa Kurmancî zêde nekirîye. Bi dîtina min Rêberê hin pêngavên berfireh beru standard kirina bikaranîna çend bêjeyên Kurmancî ku bi hin şêwazên ciyawaz dihên xebitandin avêtine, wek: ...*” – û li vira mamosta bi çar xalan nêrînen xwe tîne zimên. Û di xala sêyem da dibêje, ku: “*Paşdaçekên “da, ra” li hin deveran sivik bûne û bi şêweyê (de, re) dihên xebitandin. Bo standardkirina vê mijarê jî Rêberê tekez kirîye ku paşdaçek divê li resenîya xwe bihên xebitandin*”.

¹ Deham Ebdulfetah: Daxwîyanîyek di derbarê “Rêbera rastnivîsê” da. – R'ojnameya “Pênûsa nû”, hejmara 81., r'ûp'elên 1, 2, 4 – <http://www.penusanu.com/>

² https://www.amidakurd.net/ku/tekst/DEMA_MIROV_LI_SER_PIRSGIRÊKÊN_ZIMANÊ_K_URDÎ_BI_SÎSTÊMÎ_R_ADIWESTE_HEMÛ_BINGEH_Û_SERSEDEMÊN_WAN_DE_RTÊN_BER_Ç_AVAN

³ https://www.amidakurd.net/ku/tekst/DEMA_MIROV_LI_SER_PIRSGIRÊKÊN_ZIMANÊ_K_URDÎ_BI_SÎSTÊMÎ_R_ADIWESTE_HEMÛ_BINGEH_Û_SERSEDEMÊN_WAN_DERTÊN_BER_Ç_AVAN_III

Wê demê ji bo min pirs a r'astnivîsîn û r'astxavtina paşdaçekên "r'a", "va" û "da" girîng bû, lewra ku mijara lêgerînê min hema ew bû. Lêbelê di derbarê t'evahîya Daxwî-yayanîyê da nêr'înek a min pêk hat, a ku min wê demê anî zimên. Û ew jî, eger tê bîra xwendevanên heja, weha bû:

"... ji talebextan r'a, wek ku tê xuyan, hîç kesekî, ji bilî beşdarekî vê k'omxebatê – r'êzdar Deham Ebdulfetah, k'arê wê neşopandye, bir'yarên wê li ber ç'avan r'a derbaz nekirye, ew nenirxandine... Û. Lewra jî encamên wê hema wisa jî di cîhê xwe da mane, kesekî guh nedaye "Daxwîyanî..."-ya (bixwîne – Qêr'îna!) mamosta Deham Ebdulfetah, û piştî wê K'omxebatê zêdetirî pênc salan jî bihurye, lê hîç guhar'tinek nîne, dîsa, her tişt wek berê dimeşe ...

Helbet, bê guman, hem "Daxwîyanî..."-ya mamosta Deham Ebdulfetah, hem jî "Rêbera Rastnivîsînê" ya K'imxebata navborî tekaz divê ji hêla zimanhez û zimanzanên k'urd va bîna xwendin û nirxandin... Wisa jî mirov dizane, di hîç warekî da hîç nêr'înek û pêşniyarek bê nirxandin û gengeşî û govtûgo nayê p'ejirandin, lê divê di vî warî da pisporên zimanzanîyê pirsên zimanê k'urdî p'ir' bi baldarî, li ser bingeha zanista di derbarê zimên da (r'êzimana zanistî) û zimanzanîya giştî pirsgirêkan bi obyêtiêvî binirxînin, ji bo ku, dawîya dawîyê, di warê r'êzmana k'urdî da em bigihîjin encameke hevbeş a zanistî...

*Divê bê gotin, ku ji bo hinek xalên "Daxwîyanî..."-ya mamosta Deham Ebdulfetah mirov dikare govtûgo bike û heya gengeşîyan jî pêk bîne, lê bi giştî ew, wek nêr'în-nirxandina beşdarekî wê K'omxebatê dikare, hîç nebe, hinekî bîna zimanzanîyê bide wan tabloyan, yê ku di "Rêbera Rastnivîsînê" da hatine weşandin, û ç'avê mirov li ser r'astîya pirs û pirsgirêkan axavtina k'urdî (hem ya zarkî, hem jî ya nivîskî) veke û bingehekê ji bo nirxandinên zanistî saz bike... "*⁴

Belê, li ser weşana vê gotarê ra zêdetirî salekê bihurye, lê piştî k'omxebata navborî – êdî şeş sal! Piştî vê gotarê demeke dirêj guhar'tinek, an, hîç nebe, dengê, nêr'înek an r'exneyek ji civaka nivîsnas û xwendinhezên k'urd, ên ku xwe dilsozên ziman û çanda net'ewî dihejmêrin, dernek'et, heya yê ku xwe zimanzan jî dihesibînin, bédeng man...

Ev çi ye, gelo, ji hêçxemîyê tê, yan – tiştê ku ew bibêjin, nîne?

Nizanim, nizanim!... Lê, dîsa, her çi jî hebe!

Lê piştî demekê, piştî weşana wê gotara min a navborî ji nava xwendevanên me yê dayîmî hinek helwestan r'û dan. Û, bi r'astî jî, her çendî ew ne ku pêşniyar, an dîtînen konkrêt, lê her t'enê r'ûdana helwestan bûn, dîsa jî, ewan helwestana dan xuyan, ku xwedîyên zimanê dê di xewê da, bê helwest nemane, ku, eger r'ewş û mercên pêwîst bîna afrandin, ewê di vî warî da çalaktir bibin, û dê bi pratîkî beşdarî pêvajoya lêgerîn û p'erwerdeya zimanê k'urdî bibin.

Weha, eger mirov gotnên xwendevanên me: Şengul Sefer a ji Îzmîre, Sûrênê Bedir ê ji Ermenîstanê, Berfîna Serdar a ji Holandayê, Sedat Diljan ê ji Sasonê, Bavê Bêrîvanê ê ji R'ojavayê K'urdistanê û R'eşad Sarîbaba yê ji Stambolê bigihîne hev û t'omar bike, dê bikaribe wan gotinan, wek nêr'înekê, weha şêwazdar bike: *"Dema mirov tiştên weha di derbarê zimanê k'urdî da dixwîne, bawer nake, ku dikare r'ojekê r'êzimanek a k'urdî jî, wek ên zimanên gelên dinê, bê amadekirin, a ku bibe bingeha p'erwerdeya zimanê dê, û zar'okên k'urd jî bikaribin, bi hêsane, bêyî ku bik'evin nava t'evlihevî û serêşîyan, zimanê xwe fêr bibin... Ma ne, di nav gelê me da, hem li welêt, hem jî li derveyî welêt, pisporên r'êzimanê û zimanzanîyê hene, ji ber çi ew bédeng in, çima ew li cîyekî berev nabin, bi hev r'a k'arekî bi r'êk û pêk ji bo lêgerînê pirsgirêkan zimên t'evger nakin?"*

Û di nava van da wisa jî bangê ji bo min, wek nîvxejd-nîvr'exne cuda dibe: *k'a çima ez vê pirsê ji xwe dûr dixim û hêvîya hinekên dinê dihêlim, li şûna bi carekê va wê binirxînim û r'avebikim...*

Lê K'erem ê Qaso ê ji herêma Yêkatêrînbûrgê ya Fêdêrat'sîona R'ûsîyayê dinivîse: *"... Di dema xwe da min p'erwerdeya çend zimanan dîtye (r'ûsî, ermenî û almanî),*

⁴ Li nasîya 3. binihêr'in!

serederîyê li qanûnên r'êzimanî dikim, lê ev şiroveyana nak'evin serê min. Tûyê bibêjî, qey endamên wê k'omxebatê ne ku di derbarê zimanê xwe yê dê da, lê di derbarê tiştên ne ji vê cîhanê da diaxivîn... Çima, gelo, ma ewqasî jî dibe?! – Ew dipirse û didomîne: – ... Min bala xwe da encamên wê k'omxebatê, yên ku mamosta Deham dinirxîne, bi r'astî, ez ecêbmayî bûm! Ewê bûyera danasîna wî tiştê nenas ê fir'indeyî (TNF // UFO), ê ku sala 1947-an li herêma New Mêk'sikoya DYA-ê (Roswell UFO incident – New Mexico/USA) pêk hatibû, anî bîra min,⁵ dema pisporên şaxên zanistê yên cuda yên leşkerî û medenî lê civyabûne û serê xwe êşandine, xwestibûne têbigihîjin, k'a ew teknîka nenas çî ye û dikare ji k'u hatibe?!... ”

Di destpêkê da bibêjim, ku min hîç carekê jî xwe ji ber pirsên aloz nedaye paş, lêbelê, bi dîtina min, dê ne r'ast be, eger di pirsê mijara gotinê da t'enê mirovek bersîva wan pirsan hilde ser milê xwe, lewra ku ew, wek pirsê girîng, pêdivîya xwe hem bi nirxandineke hevbeş heye, hem jî, bi wî awahî dê ji hêla helwesta berbi pirsê va ne di cîh da be. Lewra jî, dema îro nêr'în û helwestên xwendevanan li ber destê me hene, em dikarin pirs û pirsgerêkên zimanê xwe bi hev r'a binirxînin...

Divê bê gotin, ku “Daxwîyanî...”-ya mamosta Deham ne ku t'enê hewlek e, ji bo makkirina kurtî-kêmasîyên “Komxebata” navborî, “Rêbera Rastnivîsînê”, r'êzimanê, bi giştî, û destnîşankirina r'ê û r'êbazên ç'areserîya wan, lê. her weha, ew bi xwe jî bi xwe r'a gelek pirs û pirsgerêkan tîne, yên ku, pêdivîya xwe bi nirxandin û dahûrandina (analîzkirin) r'êzimanî hene.

Û, lewra jî, ezê li vira li ser wan pirsgerêkên r'êzimanî r'awestim, ên ku an mamosta Deham bi xwe hewl daye bibîne, an jî di “Daxwîyanî...”-ya wî da dertên pêş xwendevanan.

Weha!

Hema di destpêkê da mamosta Deham destnîşan dike, ku di p'irtûka “Rêbera Rastnivîsînê” da hinek kêmasî hene, û hinek ji wan jî digihîjin r'adeya şaşîyên r'êzimanî, yên ku qet naên p'ejirandin.

Û piştî van têbînîyan ew dide zanîn, ku, her çendî, encama k'arê hevbeş ê beşdarên vê “Komxebatê” (p'irtûka “Rêbera Rastnivîsînê”), li gel hemû kêmasiyên xwe, pêngaveke dîrokî ye û xwedî giringiyeke t'aybet e jî, lê ev nirx û girîngî qet wî mafî nadin, ku mirov ç'avên xwe li ber wan şaşîyan bigire û r'ê li ber wê veke, lewra ku ev r'ewşa heyî dê ji bo r'astnivîsîna zimanê me bibe bingeş.

Piştî vê mamosta dibêje, ku, her çiqas, ew endamekî k'omxebatê bûye jî, lê, mixabin, dema gotebêjkirina hinek mijarên aloz dengê wî û yên hinek endamên dîtir li ber dengvedana r'êvebirên k'omxebatê (ew wan wek *serk'êş* nav dike) nimz bûne û nehatine bihîstin, lewra jî di vê r'ewşê da hinek bir'yarên nedurist hatine wergirtin û cîhên xwe di nava r'ûpelên p'irtûka “Rêbera Rastnivîsînê” da dîtine.

Eger wisa ye, wê demê pirs dertê holê, k'a ev bir'yarana çiqasî encamên k'arekî hevbeş bûne?! Mirov êdî di derbarê zanistîbûn û destûrmendîya wan da tiştêkî nabêje.

Û. her çiqas, ev ji bo mijara me ya îroyîn ewqasî jî ne girîng e, lê ji bo têgihîştuna pirsê bi giştî xalek a r'êgezî ye!

Li ber destê me daxwîyanîya beşdarekî wê k'omcivînê heye, ya ku bi serê xwe nirxandineke balk'êş e û gelek t'erefên r'ewşa îroyîn a r'astnivîsîn û r'astaxavtina zimanê k'urdî dide xuyan, a ku di axavtina nivîskî û zarkî ya r'ojane da serdest e.

Pirsa yekem, a ku li bal mamosta Deham r'û daye, ew şewazê nivîsîna navên beşên cuda yên K'urdistanê ye.

Weha, ew vê pirsê çawa dibîne, û dîtina xwe di vê derbarê da çawa r'êz dike:

“1- (R.27): “Navên bajar û bajarokên Kurdistanê Bakurî” - (R.29): “Navên bajar û bajarokên Kurdistanê Başûrê Rojavayî”.

Di derbarê vê derbirîna da, du pirs di serê min da digerin:

a- Ev “î” ya ku gihastîye navên hêlan (bakurî, rojavayî), gelo çî ye û çî wateyê dide derbirîna?!

⁵ https://ru.wikipedia.org/wiki/Розуэльський_инцидент

Bi dîtina min ev “î” li vir ne nîşandeka tewangê ye, ne ya raspartinê (nisbetê) ye jî. Bi vê dîtînê hebûna “î”yê bargiranîyeke zimanî ye, dikeve warê şaşîyên rêzimanî.

b- Dema ku em dibêjin (Kurdistana Bakurî) dihê wê wateyê ku çar Kurdistan hene (Kurdistana Bakurî, Kurdistana Başûrî, Kurdistana Rojhilatî, Kurdistana Rojavayî).

Ev jî şaşîyeke dîtir e, nayê pejirandin.

Rastîya derbirînê ew e, ku bihê gotin: (Navên bajar û bajarokên bakurê Kurdistanê û rojavayê Kurdistanê...)”.

Mirov li vira dikaribû çî bigota?

Hema di sêrî da divê bê gotin, ku dîtina mamosta Deham di pirsê navên beşên K’urdistanê da, ku ew divê weha bîn nivîsîn: *Bakûrê K’urdistanê, Başûrê K’urdistanê, R’ojavayê K’urdistanê, R’ojhilatê K’urdistanê*, r’ast e!

Lê di wê pirsê da, ku şewazên *bakûrî, başûrî, r’ojavayî, r’ojhilatî* ji hêla mamosta Deham va naên p’ejirandin, ji ber ku ... ew tê nagihîje, k’a ew “î”-ya ku gihaştîye navên hêlan (*bakurî, r’ojavayî*), çî ye û çî wat’eyê dide derbirînê. Bi dîtina mamosta ev “î” li vir ne nîşandeka tewangê ye, ne ya ra’spartinê (nisbetê) ye jî. Û, lewra jî, ew hebûna “î”-yê bargiranîyeke zimanî û şaşîyek a r’êzimanî dihejmêre.

Û li vira her mirovek, ê ku p’ir’î-hindikî bi r’êzimanê r’a nas e, dê bixwaze bipirse: “Ew, ku nikare, çar K’urdistan hebin, ku K’urdistanek heye û beşên wê yên cuda hene, em tégihîştin, lêbelê ev “î”-ya “r’eben”, çî sîucê xwe heye?” – Û ewê mafdar be! Lewra ku awaz, an tîpa “î” li vira *p’arînk* e, ya ku, dema li p’eyvên cuda zêde dibe, ji wana r’engdêran saz dike: *bakûr – bakûrî, başûr – başûrî, r’ojava – r’ojavayî, r’ojhilat – r’ojhilatî*. Û di zimanzanîyê da jî ji van p’arînkên r’a *afîk’s*, an *sûfîk’s* (affix // suffix) tê gotin.⁶ Emê li vira evê p’arînkê bi mercî *p’arînka r’engdêrsaz* navbikin (xwendevan dikarin di vê derbarê da nêr’înên xwe bibêjin û pêşnîyarên xwe ji bo me r’êbikin).

Û, eger li şûna şewazên *K’urdistana Bakûrî, K’urdistana Başûrî, K’urdistana R’ojavayî*, yan *K’urdistana R’ojhilatî* şewazên: *beşê* (an *p’arç’eyê*) *bakûrî, başûrî, r’ojavayî*, yan *ê r’ojhilatî yê K’urdistanê* bihatana nivîsîn, ji hêla r’êzimanî ve dê t’u pirsgirêk nînbûya, lêbelê, em fêrbûne, bibêjin (an binivîsin): *Bakûrê, Başûrê, R’ojavayê, yan R’ojhilatê K’urdistanê*. Wek ku tê xuyan, wisa hêsantir e! Lêbelê, *p’arînk* a “î” (*afîk’s*), wek navgînek a r’êzimanî ya r’engdêrsaz, di zimanê k’urdî da bi berfirehî û encamdar tê k’aranîn. Mînak: partî û r’êxistinên *k’urdistanî*, p’irtûkên *wêjeyî*, kulîlkên *ç’îyayî*, mafên *xwezayî*, *mirovî û net’ewî*; her weha: t’aybetmendîyên *kesî, hunerî, awazî, r’êzimanî*, benga *ciwanî*, helwest a *lehengî, heşmendî, filosofî, comerdî*, û hwd.

Pirsa duyem, a ku di “Daxwîyanî”-ya mamosta Deham da tê nirxandin, di derbarê “Tîpa ducare” da ye, ya ku ew wisa jî “Tîpa dubare” navdike.

Em bala xwe bidinê, k’a mamosta Deham evê pirsê çawa tédigihîje û mak dike, û paşê bi hev r’a wê binirxînin:

“2- (R.44): “Tîpa ducare di morfêmên kurmancîyê yên sade da tune ye.

⁶ Di serdemên cuda da ji hêla xudan ên cuda va (author) di r’êzimana k’urdî da ji bo *p’eyv-p’arînk*, an *p’eyvên alîk’ar* têrmînên cuda hatine k’aranîn: *paşgir(r’êz), dawîne, mend, paşdank, paşbendik, pêşp’arînk, paşp’arînk, pêşp’irtik, paşp’irtik* û yên dinê. Lê *p’eyv-p’arînk* bi xwe bi r’êzimanî nehatine makkirin, k’a k’îjan ji wan di hevokê da çî erk’ê pêk tîne. Û her kesekî, yê ku di nivîsên xwe da *p’eyv-p’arînk*ek k’aranye, wat’e û erk’a wê ya di zimên da li ber ç’avan negirtye. Lewra jî, dema dor hat ser wê pirsê, k’a di k’urdî da mirov ji wan têrmînan k’îjanê dikare ji bo *p’eyvên “afîk’s”* an *“sûfîk’s”* (“affix” // “suffix”) k’ar bîne, ew pirsê bê bersîv ma.

Ango, divê di sêrî da hemû *p’eyv-p’arînk* anegorî wat’e û erk’a xwe ya di hevokê da bîn dabêşkirin, paşê ji bo her beşekî ji wana navekê bîlîbjartin. Lewra ku, ji çî hêlê va jî mirov li wan *p’eyvşewazên* li jorê binihêr’e, hemû jî *p’eyv-p’arînk*, an *p’eyvên* ne t’am ên alîk’ar didin zanîn... Lewra jî ezê evê pirsê ji bo gotara tê bihêlim, lê li vira têrmîna *p’arînk* an *afîk’s* k’ar binim.

Wisa jî dê baş bibûya, eger xwendevanên me yên zimanhez û zimanzan nêr’înên xwe di derbarê vê mijarê da ji me r’a bişandana ...

Bo zelalkirina vê mijarê komxebata Rêberê van mînakên di ber çavan ra derbas dike: weha binvîse, weha nenivîse birîn, birrîn ...

Baş e, di vê hevokê da: (Birîna Çeto bû sedema birrîna destê wî). Eger em li gora Rêberê bibêjin (birîna Çeto bû sedema birîna destê wî). Gelo wate ji vê hevokê ra heye?! Çawa birîn dibe sedema birînê?! Ya rast ew e ku birîn axivîye, bûye nexweşîya “gergerîna” û dawî ji neçarî dest hatîye birrîn.

Li vê gorê birîn bûye sedema birrînê!

Di bîra min da ye, dema ku ev mijar di civîna Mêrdînê da hat rojevê, min destê xwe bilind kir û got: Di kargeha kevîran da du karker bi navê Salih hene. Yek ji wan kevîran dibirre û wan bo lêkirinê amade dike, yê dî jî wan dibe. Li vê gorê yek Salihê kevîrbir e û yê dî Salihê kevîrbir e. Vêca ku em tîpa dubare nenivîsin, em ê çawa wan her du Salihan di nivîsinê da ji hev binasin (dibe ku li vira mabest cudakirin e! – E. C.)?!

Hingê komxebatê pêwendîyek telefonî bi zanyarê Emrîkî Maykil Çayit ra girêda û pîrsa vê mijarê jê kir. Maykil got: *Ev mijar pîrsgirêkeke aloz e, divê çareser bibe. Lê mixabin ev pîrsgirêk di her du çapên Rêberê da jî nehat çareser kirin*”.

Balkêş e, ne? Mînakên k’urdîya zêndî li holê ne, ku bi dehmiîlonan k’urd pê diaxivîn, êdî jimêjva, di zimanzanîya giştî û r’êzimana zanistî da bi zanistî hatye makkirin, k’a k’îjan awaz (deng) dikarin tîpa xwe hebin, heya ji bo zimanên cuda r’ê û r’êbazên amadekirina alfabeyên zanistî hatine dîtin, lê em, k’urd, hê jî bi alfabeyeke nivîşkan dinivîsin û ji bo ku nivîşkanîya wê binixêmin-veşêrin, van tîpên “ducare” û “dubare” ji ber xwe derdixin, wan li serê xwe dikin bela û xwe pê mijûl dikin! Û ev jî wê demê, dema ji bo zimanê k’urdî di Yekîtiya Sovêtê da anegorî qanûnên awazsazîya zanistî du alfabê hatibûne amadekirin, û di wana da hemû awazên wat’eguhêr’ (*fonêm*) xwedî tîp in, bi dehsalan bi wan alfabeyan p’erwerde pêk hatye, p’irtûkên dersan, wêjeyeyeke dewlemend û r’ojname hatine weşandin, û nimûneyên wan jî di p’irtûkxaneyan da hene, lê hinek îro r’abûne û wek nimûneyên *zimanekî kevnar*, ku îro bi wî nayê axavtina (ji van r’a *zimanên mirî* tê gotin!), li mînakên zimanê k’urdî dinîhêr’in, wan bi wî ç’avî dinirxînin, û, dema ku dik’evî tengasîyê, p’êwendîyek a t’elefonî bi zanyarê amêrikî r’a datînin û pîrsa vê mijarê ji wî camêrî dikin (bi r’astî jî, mirov dixwaze biqîr’e – hey wax!). Û ew camêr jî, ji wan r’a dibêje, ku ew mijar pîrsgirêkeke aloz e, divê ç’areser bibe (!?) ...

De îjar were, û ...! Bi r’astî, mirov li vira bêzar dibe û nizane çi bibêje!

Lê, dîsa jî, her çi hebe...

Belê, r’ast e, mamosta Deham pîrsgirêkê dibîne, heya r’adeyekê destnîşan jî dike, lê ew tîpên “ducare” û “dubare” nikarin kêrî ç’areserîya pîrsgirêkên zimên bînin. Lewra ku bi wan tîpên bi sîmî hinartî nivîşkanîya berdest a alfabeya k’urdî nikare bê t’endurustkirin, û ji holê r’abe. Ya ku dikare vê pîrsgirêkê yekser ç’areser bike, ew, anegorî qanûnên zimanzanîya giştî û r’êzimana zanistî, werguhar’tin û vesazandina (r’êform) alfabeya k’urdî ye, ji bo ku di wê da hemû *fonêm* (*awazên wat’eguhêr’*) tîpa xwe hebin. Hew!

Û wê demê ji bo ç’areserîya hemû nak’okî, t’evlihevîyan dê pêdivî bi hinartina wan tîpên “ducare” û “dubare” namîne.

Di derbarê pîrsgirêkên alfabeya k’urdî û r’ê û r’êbazên ç’areserîya wan da gotara min a “Nivîsa k’urdî – r’astîya dîrokî, pîrsgirêkên wê û r’êyên ç’areserîyê”⁷ heye. Di derbarê vê mijarê da wisa jî gotarên “Hinek r’aman û nêr’in li ser p’ergala zimanê k’urdî û zimanzanîyê”⁸ û “Di navbera nedestûrmendîyê û amatorîyê da”⁹ li holê ne!

⁷ https://www.amidakurd.net/ku/tekst/NIVÎSA_K_URDÎ_R_ASTÎYA_DÎROKÎ_PIRSGRÊKÊN_WÊ_Û_R_ÊYÊN_Ç_ARESERÎYÊ

⁸ https://www.academia.edu/100024642/HINEK%20R_AMAN_Û_NÊR_ÎN_LI_SER_P_ERGALA_%20ZIMANÊ_K_URDÎ_Û_ZIMANZANÎYÊ

⁹ https://amikurd.net/ku/tekst/û_heya_k_engê_di_navbera_nedestûrmendîyê_û_amatorî_yê_da

Lêbele, dertê holê, wek ku di nava gel da tê gotin: “Aş – bi xiyalekê, aşvan – bi xiyalekê!”

Her çi jî hebe, k’a, em nîrxandinê xwe bidomînin!

Yek ji xalên here girîng, minê bigota, ya here girîngtirîn, xala di derbarê “tewang”-a jimarnavan da ye.

Hema di sêrî da divê bê gotin, ku tewang, wek t’aybetmendîyeke r’êzimanî, t’u têt’îliya xwe ne bi jimarnavan r’a, ne jî bi beşekî axavtinê yê dinê r’a nîne, ew bi serê xwe t’aybetmendîya r’êzimanî ya navdêr e. Lê jimar, an beşekî axavtinê yê dinê, her wê demê têtewandin, dema ew di hevokê da wek navdêr têt k’aranîn û erk’a navdêr pêk tînin. Ango ew êdî navdêr in û, lewra jî, wek navdêr, jimar, zayend û tewanga xwe hene!

Lê, her çi jî hebe, em binihr’in, k’a mamosta Deham evê mijarê çawa têdighîje û çawa mak dike! Weha:

“3- Di mijara tewanga jimarnavan (hejmarnavan) da jî Rêber çend şiroveyên cûrecûr di ber çavan ra derbas dike:

- (R.180) a: “lewra hin kurmancîaxêv zayenda hejmarnavên bingehîn “mê” dihesibînin, li gora wê dinivîsin û herweha di halê tewangê da ji wan li gor zayenda “mê” ditewînin (ji yekê, ji duyê, ji sêyê)”

- (R.181) b: “Hin kurmancîaxêv jî hejmarnavan “nêr” dihesibînin û di wan rewşan da ku rêzimana kurmancîyê tewangê ferz dike, hejmarnav li gor zayenda “nêr” ditewînin, komxebata me piştî nîqaşeyên pîralî her du awa jî di nivîsîna kurmancîyê da qebûl dike”.

Di heman rûpelî da jî Rêber pê da diçe û dibêje: “...Li gor vî awayî (awayê nêr): Hejmarnavên kurmancîyê yên bingehîn, ji bilî hejmarnava “yekê” hemû nêrin;

2- Ji hejmarnava “du” yan heta milyaran hemû hejmarnav bi “an” ê dihên tewandin”.

Bi rastî ev şiroveya tewanga hejmar navan gelekî seyr û balkêş e, aloz û tevlihev e qet nahê têgehiştin.

Di (R.180) yê da dibêje hin kurmancî axêv zayenda hejmarnavan bingehîn mê dihesibînin. Ev gotin zelal e, lê ji hêla duristî û neduristîyê ve ew tiştêkî dîtir e.

Di (R.181) ê da jî dibêje hin kurmancî axêv hejmarnavan nêr dihesibînin. Li vê gorê jî tewanga hemû hejmar navan (ji bilî yekê) bi “an” ê dihên navan (ji bilî yekê) bi “an” ê dihên tewandin.

Kî dikare di vê şiroveyê da bigihêje, ka çi dibêje?!

Ji hêlekê ve hemû hejmarnav nêr in û ji hêleke dî ve jî dibêje tewanga wan bi “an” ê pêk dihê. Ma ev dibe?!

Em dizanin ku nîşandeka navên nêrzayên yekjimar “î” ye û ya navên mêzayên yekjimar “ê” ye û ya her du zayendên komjimar jî “an” e.

Vêca çawa “an” dibe nîşandeka tewandîna hemû hejmarnavên nêrza.

- Di (R.182) yê da jî Rêbera Rast nivîsîne dibêje: “Hejmarnavên bîst, sîh, çil, milyar..., bi “î” yê dihên tewandin”.

Bi dîtina min ev jî şaşîyeke gelêrî ye ketîye ser zimanê hindek kurmancî axêvan, ne tevan.

Bi bawerîya min tewanga hemû hejmarnavan bi vî şeweyî zelal dibe: Hemû hejmarnav ji hêla tewangê ve dibin du beş:

- Hejmarnavên bingehîn;

- Hejmarnavên rêzîn (rêzgir);

a- Hejmarnavên bingehîn ji yekê heta dawîya hejmarnavan (1, 2, 3, 4, 10, 40, milyon ...) li gora zayend û mêjerên berjimarên xwe dihên tewandin:

1- Hejmarnava yekê li gora zayenda berjimarê xwe dihê tewandin, wek:

- Ez hespekî dixwazim (ez yek hespî dixwazim);

- Ez mehînekê dixwazim (ez yek mehîne dixwazim);

2- Ji duwan heta dawî (2, 3, 5, 50, 90, milyar...) bi nîşandeka kombêjîyê “an” ê dihên tewandin, wek:

- Ez du hespan dibînim (ji hespan ez duwan dibînim);

- Ez bîst hevalan dinasim (ji hevalan ez bîstan dinasim);
- Ez şêst pirtûkan dixwazim (ji van pirtûkan ez şêstan dixwazim).

Dîyar e ku hejmarnavên van mînanan li gora mêjerên berjimarên xwe hatine tewandin. Berjimarên wan jî kom in û ew jî bi “an” ê hatine tewandin.

b- Hemû hejmarnavên rêzîn (rêzgir) yên ku li pey hev in li gora zayenda berjimarên xwe yên mêza bi “ê”yê dihên tewandin wek:

- Memo di pola şeşê da ye (ji rêzên polên xwendinê Memo di pola şeşê da ye);
- Dara dehê ya sêvan e (di rêza van daran da ya bi hejmara dehê ya sêvan e). ”

Ji ber ku li vira nak’okî û t’evlihevî ewqas in, ku, wek xwendevanê me Barîyê R’izgan ji Almanîyayê dinivîse, eger mirov bik’eve nava wan, dikare nigê xwe bişkêne, ezê li vira bi kurtasî t’aybetmendîyên bingeîn ên r’êzimanî yên jimarê (jimarnavê), wek beşekî axavtinê, mak bikim, bila xwendevan bi xwe ji vê û pêva anegorî wan t’aybetmendîyan hemû nak’okî û te’vlihevîyan bi r’êzimanî, binirxînin.

Weha, jimarnav, an jî jimar yek ji beşên serbixwe yê axavtinê ye û piştî navdêr û r’engdêr ê sêyem e. Jimarnav *çendî*, *çiqasî*, an *jimara* tiştan, kesan û bûyeran, an jî *hejmara* wan di r’êza yên mînanî wan da didin zanîn û bersîva pirsên “*çend?*”, “*çiqas?*”, “*çendem / çemdemîn / çenda / çendan?*” didin.

Û, anegorî wan t’aybetmendîyên r’êzimanî jî, jimar (jimarnav) bi bingeîn dabeşî ser du k’oman dibin: *jimarên çendî* û yên *r’êzî*.

a) Jimarnavên *çendî* jimara tiştan, kesan û bûyeran didin zanîn.

Mînak: *Hevt mirov, deh şagirt, donzdeh pêûs, çar ders, hezar xwendk’ar, mîlîon k’arker, sê pêşbirk, du pezk’ûvî, hevt gul û yên dinê.*

b) Jimarnavên *r’êzî* hejmara *tişteki*, an *çend tiştan*, *keseke*, an *çend kesan*, *bûyereke*, an *çend bûyeran* di r’êza yên mînanî wan da didin zanîn. Ango, ew didin zanîn, k’a ew tişt di r’êza yên mînanî xwe da ya/yê/yên/yêd *çendan / çendem / çendemîn* in.

Di k’urdî da du k’omên jimarnavên *r’êzî* hene:

1. Yên ku bi r’êya li *jimarên çendî* zêdekirina paşp’arînk (afîk’s) ên hejmarsaz ên “em” û “emîn” pêk tên.

Mînak: *yekem / yekemîn; hevtêm / hevtêmîn; bîstem / bîstemîn; çilûpêncem / çilûpêncemîn; nodûnehem / nodûnehemîn* û h.w.d.

2. Yên ku bi r’êya li *jimarên çendî* zêdekirina paşp’arînk (afîk’s) ên hejmarsaz ên “ê”, “î”, an jî “an” pêk tên.

Mînak: *yekê, duyan (duduyan), hevtan, nehan, dehan, yanzdehan, panzdehan, nonzdehan, bîstî, bîstûyekê, bîstûduyan, bîstûnehan, sîhî, çilî, hevtêyî, nodî, sedî, pênsidî, nehsidî, hezarî, mîlîonî* û h.w.d.

Û, wek ku hema di destpêka vî beşî da hate gotin, tewang, wek t’aybetmendîyeke r’êzimanî, t’u tîk’ilîya xwe ne bi jimarnavan r’a, ne jî bi beşekî axavtinê yê dinê r’a nîne, ew bi serê xwe t’aybetmendîya r’êzimanî ya navdêr e. Jimar, an beşekî axavtinê yê dinê, her wê demê tên tewandin, dema ew di hevokê da wek navdêr tên k’aranîn. Navdêr jî, wek ku tê zanîn, *jimar*, *zayend* û *tewanga* xwe hene!

Ez bi bawer im, ku ev zanînen destpêkî dikarin bi xwendevanan r’a bibin alîk’ar, ji bo ku ew bikaribin serederîyê li pirsê bikin û t’evlihevî û nak’okîyên di vî warî da ji hev vebijêrin ... Lê, eger li bal hinekan pirs r’û bidin, em dikarin bi hev r’a binirxînin û bersîvên pirsên wan bibînin.

Bi vî awahî her xwendevanek, dikare beşdarî nirxandinan bibe, nêr’înên xwe bibêje, tişteki bip’ejirîne, an r’ed bike û bi vî awahî bibe hevxudanekî (co-author) van gotaran...

Ezê benda nameyên we bim, xwendevanên hêja, hûn dikarin name û p’eyamên xwe bi vê navnîşanê ji me r’a r’êbikin: mamazi@yanex.ru.

Lê li ser xalên dinê yên Daxwîyanîya kekê Deham emê di gotara tê da r’awestînin û bi hev r’a wan binirxînin.